Rheinland-Pfalz
MINISTERIUM FÜR BILDUNG

**Kursên ziman yên pişuyî/tehtîlde – Pella zanyarî**

Dê u bavên birêz

Zarokên we kurseka Almanî ya dibistanê/medresê de cihdigrin. Di ser vêre em kurseke zudemî di pişuyêde bê pare/belaş pêşkêş dikin. Zarokên we dikanin bi vê rêyê zimanê Almanî zutir fêrbibin. Ewê kanibin baştir beşdarî dersê bibin.

Mamosteyên Almanî yên dibistanê dê kişif bikin, ka gelo divêt zarokê we beşdarî kursa pişuyê bibe an na. Mamoste navnusîna zarok bo kursa pişuyê bike, heke hun wek dê u bav **selmandina xwe** li ser vê yekê **bi formeke bidin**. **<u>Hun bi xwe nikanin zarokên xwe tomar/qeyd bikin.</u>**

Kursa pişuyê ya ziman hefteyek yan du hefteyan d`ajo. Kurs ji 20 dersan pêktê (pişuya Ostern u pişuya Pfingsten) yan jî 40 kajimêrên/saetên (pişuya havîn u pişuya payizê) pêkdihêt. Kurs pêşnîvro an paşnîvro dihête birêvebirin. Zarok ji bal mamosteyekî din ve (mamosteya/ê Volkshochschule) dê werin perwerdekirin.

Di kursande berî her tiştî dê gellek Almanî were axaftin. Mezinahîya komikan/grupan dê ji 6 ta 8 xwendevanan pêkwere. Kurs hene bo dibistanên bingehîn (Grundschule polên 1-4), u kursên polên 5-10 u kursên bo xwendevanên dibistanên amadeyîya pîşe.

## Bi kerema xwe bal bidin:

## Tomar/qeydkirina bo kursa pişu îcbarîye u beşdarîya herdemî jî herwisa îcbarîye.